



# QURBANIYÊN BAZIRGANIYA BI MIROVAN MAFÊ ALÎKARIYA HUQÛQÎ HEYE

Ev namilke derbarê alîkariya bo qurbanîyên bazirganiya bi mirovan e.

Pergala alîkarîkirina qurbanîyên bazirganiya bi mirovan (pergala alîkarîkirinê) dezgeheke hikûmî ye ku li Fînlândayê alîkariya qurbanîyên bazirganiya bi mirovan dike.

## Alîkarî bo KÊ ye?

Dikarî bibî mişteriyek pergala alîkarîkirina qurbanîyên bazirganiya bi mirovan eger tu

- qurbanîya bazirganiya bi mirovan bî û loma hewceyî alîkariyê bî.
- zarokek qurbanîyek bazirganiya bi mirovan bî ku hewceyî alîkariyê bî.
- alîkarek lêkolîna tawaneke bazirganiya bi mirovan bû ku hewceyî alîkariyêke taybet bî.

Pergala alîkarîkirinê alîkariya hemû kesan dike bêyî cudahiya temen yan welatîniyê, cinsî û dînî. Herwiha welatîyên Fînlândayê jî.

Dikarî alîkariyê wergirî geta eger mafê te yê mayîna li Fînlândayê tine be jî. Dikarî alîkariyê wergirî heta eger te bi xwe jî tawan kiribin.

## Dikarî alîkariyê wergirî heta eger tawanan ranegihînî jî

Pergala alîkarîkirinê alîkariyê dide heta eger nexwazî derbarê bazirganiya heta eger polîs haydar nekî jî. Pergala alîkarîkirinê derbarê te polîs haydar nake. Alîkariya te dikin derbarê haydarkirinê eger bixwazî polîs haydar bikî.

## Dikarî ÇI ALÎKARIYÊ ji pergala alîkarîkirinê wergirî?

Dikarî alîkariyê ji pergala alîkarîkirinê wergirî gava ku bibî mişteriyek pergala alîkarîkirinê.

Alîkarî dikare bo nimûne wiha be:

- Şîret û rêberî
- Alîkariya haydarkirina polîs eger bixwazî haydar bikî
- Piştgirî û parastina dema proseya mehkemekirinê
- Alîkariya peydakirina parêzer yan alîkar eger hewce be
- Xizmetên tenduristiyê
- Xizmetên sosyalê
- Vehewandineke biewle
- Alîkariya aborî eger pereyên te tine bin
- Xizmetên terciymanî û wergerandinê eger hewce bin

Bo welatîyên biyanî herwiha:

- Eger bêyî îqameyê qanûnî li Fînlândayê bî, pergala alîkarîkirinê dikare *demeke bîrlêkirinê* bide te. Mebest ji dema bîrlêkirinê ew e ku 1 - 6 mehan bi qanûnî li Fînlândayê bî û ne hewce ye ku ji welat derkevî.
- Piştgirîkirina vegeerîna biewle eger bixwazî vegeerî welatê xwe
- Şîret û rêberîya dawakirina îqameyê

Em ê bi te re lê bifikirin ka tu hewceyî çî alîkariyê yî.

Ne hewce ye alîkariyê wergirî eger nexwazî.



## Wiha xizmet tê kirin

pergala alîkarîkirinê te digihîne xizmetên bo te hewce

- Eger bi resmî rûniştîyek Fînlândayê bî  
Li Fînlândayê herêmên refahê xizmetan didin te. Pergala alîkarîkirinê hevkarîyê li gel herêmên refahê dike. Dikarî ji pergala alîkarîkirinê şîret û rêberiyê wergirî.
- Eger penaxwaz bî  
Dikarî xizmetan ji navenda penaxwazan wergirî. pergala alîkarîkirinê bi hevkarîya berdewam li gel navenda penaxwazan alîkariya te dike. Dikarî ji pergala alîkarîkirinê şîret û rêberiyê jî wergirî.
- Eger ne bi resmî li Fînlândayê bî  
Pergala alîkarîkirina qurbaniyên bazirganiya bi mirovan xizmetan dide te.

## Wiha dibî mişteriyek pergala alîkarîkirinê

Karmendên sosyalê, rêxistinek, polîs yan bo nimûne karmendê dêrê dikare te bişîne pergala alîkarîkirinê daku alîkariyê wergirî. Ew dikarin te bişînin pergala alîkarîkirinê tenê eger ruxset bidî wan. Mebest ji ruxsetdanê ew e ku ew dikarin agahiyên te yê şexsî bidin pergala alîkarîkirinê.

Pergala alîkarîkirinê hewceyî agahiyên derbarê wê yekê ku çî li te qewimiye û tu hewceyî çî alîkariyê yî.

Eger pergala alîkarîkirinê hewceyî zêdetir agahiyên rewşa te be, ew dikare ji te yan ji karbidestên din bipirse.

Bi wan agahiyên karmendên pergala alîkarîkirinê lê difikirin ka gelo dibe tu qurbaniyek bazirganiya bi mirovan bî û hewceyî alîkariya pergala alîkarîkirinê yî

## Bi xwe jî dikarî dawa alîkariyê bikî

Tu dikarî bi xwe jî dawa mişterîtiya pergala alîkarîkirinê ya qurbaniyên bazirganiya bi mirovan bikî. Dikarî telefon bikî yan email bişînin bo pergala alîkarîkirinê û behsa rewşa xwe bikî.

Ne hewce ye piştrast bî ka bûyî qurbaniyek bazirganiya bi mirovan yan na.

## Pergala alîkarîkirinê biryarekê dide te

Pergala alîkarîkirinê herdem biryareke nivîskî dide te ka dê te bikin mişteriyek pergala alîkarîkirinê yan na.

## Dikarî bînav têkilî deynî

Eger bixwazî, dikarî bêyî gotina nav yan navnîşanê xwe jî têkilî deynî. Dikarî li gel pergala alîkarîkirinê derbarê rewşa xwe bi axivî û lê bifikirî ya dixwazî bibî mişteriyê pergala alîkarîkirinê yan na.

Bi riya malpera [www.ihmiskauppa.fi](http://www.ihmiskauppa.fi) dikarî bînav bo pergala alîkarîkirinê binivîsî.

Dikarî bi dilekî rehet têkilî deynî.

## Pergala parastinê siran diparêze



Pergala alîkarîkirinê hemû agahiyên te biewle diparêze.

Dikarî agahiyên zêdetir li ser vê malperê bixwînî: [www.ihmiskauppa.fi/myinfo](http://www.ihmiskauppa.fi/myinfo)

- Pergala alîkarîkirinê navê kesê wek mişterî pêşkêşkirî û wergirtî li ser tomara mişteriyên ya pergala alîkarîkirinê qeyd dike.
- Bikaranîna agahiyan herdem li ser bingeheê sebebên din qanûnê de diyarkirî ye.
- Agahiyên qeydkirî bi nepenî têne parastin. Karmendên ku li agahiyan dinêrin û bi kar tînin sirran diparêzin. Tenê ew kes dikarin agahiyan bibînin ku li gor qanûnê mafê wan heye.
- Belgenamêyên qeydkirî bi nepenî têne parastin û bo dîtin yan lînêrînê nadine ti kesek derveyî.
- Pergala alîkarîkirinê tenê bi rizamendiya te yan di haletên di qanûnê de diyarkirî de dikare belgenamêyên qeydkirî bide aliyên din.
- Bêyî rizamendiya te agahiyan nadin ti welatekî din.



## Têkilîdanîn li gel pergala alîkarîkirina qurbaniyên bazirganiya bi mirovan

**Tel: +358 295 463 177**

Karmendên pergala alîkarîkirinê bersiva hejmarê didin j iduşemê heta îniyê saet 8:00 - 16:15

Demên din navenda penaxwazan ya Joutseno bersiv dide. Hindê dikarî daxwaza telefonkirinê bikî yan bibêjî ku bi lezginî hewceyî alîkariyê yî.

**e-mail: [ihmiskauppa.auttamisjarjestelma@migri.fi](mailto:ihmiskauppa.auttamisjarjestelma@migri.fi)**

**[www.ihmiskauppa.fi](http://www.ihmiskauppa.fi)**

Ji malpera Ihmiskauppa.fi dikarî agahiyên derbarê bazirganiya bi mirovan, pergala alîkarîkirinê û wan rêxistinên bibînin ku alîkariya qurbaniyên bazirganiya bi mirovan dikin. Bi riya malperê dikarî bînav têkilî li gel pergala alîkarîkirinê deynî.